# Bangewaz li şahidan li ser kuştina kesekî di roja sersalê de

## Cih: Leipzig, Eisenbahnstraße/Hildegardstraße

## Dem: 31.12.2025an, saet 2:40 piştî nîvro

Li Eisenbahnstraße, rasterast li Çarrêya Hildegardstraße, di rija Sersalê de derdora saet 14:40 pevçûnek metirsidar qewimî. Merekî 22-salî (Somaliyî) bi merekî din re ket nîqaşeke devkî. Nakokî gihîşt wê astê ku dijberê wî ciwanê 22-salî a Somaliyî çend caran bi amûreke tûj kêr kir û bi peyatî ji cihê bûyerê reviya. Qurbanî ji bo nexweşxaneyê hate rakirin, li wir ji nû ve hat zindîkirin û paşê wî veguhestin klînîkeke pisporiyê, lê mixabin tevî dermankirina bijîşkî ya giran, roja Înê, 09.01.2026an jiyana xwe ji dest da.

Nivîsgeha Dozgeriya Giştî ya Leipzigê û Polîsê dijî Tawana û Sûcan a Leipzigê niha lêpirsînê li ser kuştineke pêkhatî dikin.

Tawanker heta niha nehatiye dîtin û wendaye. Tewra lêgerîneke berfireh a li derdorê jî nebûye sedema dîtina Tawanker.

Şahidan tenê karîne wesfeke giştî ya Tawanker bidin:

- **Mêr**
- **Çaketeka tarî berwîda buye**
- **Klavek tarî serwîda buye (dibe ku rûyê xwe jî pê veşartibe)**

Polîs niha li şahidên din digere ewên ku dikarin derbarê wî bûyerî û/an derbarê kesên têkildar bi wî bûyerî agahiyan bidin.

- **Kî sûcdar nas dike an dizane ew bi gelemperî li ku dimîne?**
- **Kî bûyerê ji nêz ve dîtîye?**
- **Kî wêne an vîdyoyên bûyerê kişandine?**

Ji bo ku bigihîje zêdetirîn hejmara şahidên potansiyel, ev bangewaz ji bo Zimanên Kurdî, Tirkî, Farisî û Erebî jî hatiye wergerandin. Ji we tê xwestin ku vê agahiyê bi awayekî herî berfireh belav bikin.

Ji şahidan û her kesê ku xwedî agahî ye tê xwestin ku bi Polîsê Beşa Lêpirsînê Sûcan re, bi vî Adresî:

**Dimitroffstraße 1**

**04107Leipzig**

**Tel.: (0341) 966 4 6666**

an jî bi her qereqoleke din a polîsan peywendî biken.

Di vê çarçoveyê de, li ser malpera Polîsê Saxonyayê

**https://sn.hinweisportal.de/**

portaleke agahdarkirinê jî hatiye vekirin, ku li wir wêne, vîdyo û agahî dikarin bi awayekî nenas (anonim) bên barkirin.